

16.12.2021

Pela Agahdariyê: Testkirina Xweser a Zarokan

Ji bo kêmbûna koronayê bêhtir test bikin

Dêûbavên hêja,

Em dixwazin bi vê pela agahdariyê we agahdar bikin, ka çima testkirina xwesera ya zarokê/a we bi wate ye.

Çima girîng, e ku testkirina xweser a zarokê/a we were kirin?

Ji bo kêmkirina vîrusa koronayê bibin alîkar û bi rêkûpêk ji testa xweser a bê pere ya ji bo zarokên xwe sûdê bigirin. Divê hûn bi taybet niha di vê dema rêwîtiyê de haydar bin û hay ji xwe hebin, da ku hûn zarokên xwe û zarokên din biparêzin. Test di komekê de yan jî di civatê de ewlehiyê dide zarokan. Testkirina xweser pişgiriyeke alîkar e, ku mirov dikare bi vê riyê di demeke zû de hay ji enfeksiyonê hebe û pêşî li enfeksiyonên din bigire.

Testeke xweser her car wekî **dîmeneke kurt a bûyerê** ye û ji ber vê yekê gelek girîng e, ku hûn bi rêkûpêkî testa xweser li ser zarokê/a xwe çêkin, ku her çi qas nîşaneyên nexweşiyê li gel wê nebin jî. Wisa hûn dikarin bibin alîkar, ku zarokên we û zarokên din parastî bin.



Postadresse
KiTa Bremen
Auf der Muggenburg 5
28217 Bremen

Telefon
0421-361 5700
Telefax
0421-361 59771
E-Mail
office@kita.bremen.de
Internet
www.kita.bremen.de

Straßenbahn
Linie 3,5
Haltestelle
Eduard-Schopf-Allee

KiTa Bremen
Eigenbetrieb
der Stadtgemeinde
Bremen
Geschäftsführer
Wolfgang Bahlmann
Stv. Geschäftsführerin
Petra Zschüntzsch

Deutsche Bundesbank
Filiale Hannover
IBAN
DE09 2500 0000
0025 1015 66
BIC
MARKDEF1250

Steuernummer
60-100-07915

USt-IdNr.
DE322325940



Kîjan testên xweser dê li navendên zarok û malbatan amade bin?

Ji bo zarokan testên xweser hatine pejiwandin, bi awayekî bi dilxwazî ne û bi rîya piştgiriya zanistî hatine hilbijartin. Ew ji bo zarokan ne xetere ne. Ji aliyê pêş ê hundirê pozî nimûne tê girtin. Li navendên zarok û malbatan testên xweser ên ji bo girtina nimûneya ji hundirê pozê bi awayekî bê pere tê dayîn.

Ez ê testê çawa bi awayekî rast bikim?

Ji kerema xwe re beriya, ku hûn dest bi testkirinê bikin, rêbernameyê testê bixwînin û beriya testkirina zarokê/a xwe destên xwe bişon.

Lûleyên ji nimûneya ji pozî bi taybet li gorî zarokan in. Darikê bi pembû bi qasî 1-2 cm dikeve hundirê pozî.

Di malpera Senatora ji bo Zarok û Perwerdehiyê de hûn dikarin li ser rûpela agahiyê ya li ser (Corona Informationsseite) vîdeoyeke danasîna ya li ser testên li hêlînên zarokan bibînin.

Têbinî:

Hûn vê vîdeoyê li ser vê malperê dibînin

<https://www.bildung.bremen.de/Corona-Informationsseite/>

Kita und Schulbetrieb/Kitas/Testungen/Wie funktioniert der Test für Kita-Kinder? Jarno und Katja erklären es




Ez çawa dikarin testkirina xweser ji bo zarokê/a xwe hêsantir bikin?

Ji bo xwe û zarokê/a xwe atmosfereke rehet saz bikin. Ji zarokê/a xwe re pêngavên testa xweser bibêjin, da ku ew fam bike, ka çi diqewime. Ji kerema xwe re zarokê/a xwe li hemberî daxwaza wî/wê test nekin. Her carê nîşanî zarokê/a xwe bidin, ka hûn paşê çi dikin. Çêtir e, ku hûn bi hev re bi awayekî lîstikî berê biciribînin. Yan jî hûn dikarin her wisa bihêlin, ku zarokê/a we bi xwe biciribîne, ka test çawa çêdibe. Belkî zarokê/a we bixwaze testê pêşî bi bebika xwe ya potikî re yan jî bi hirçoka xwe re biciribîne.



Divê testa xweser çend caran li ser zarokê/a we were kirin?




Testên xweser Duşem û Pêncşem serê sibehê beriya destpêkirina lînerîna danê rojê li malê tê kirin. xweser têne kirin. werden montags und donnerstags morgens vor Kitabeginn zuhause durchgeführt.

Heger we testê li malê ji bîr kiribe, hûn dikarin bi îstîsnayî li navenda zarok û malbatan testê bikin.

Testkirina xweser a bi rêkûpêk gelek girîng e, da ku di demeke zû de hay ji enfeksiyonê çêbe û zarok werin parastin.

Piştî encama pozîtîv a testê ez ê çawa tevbigirim?

Gava encama testê pozîtîv be, hingê zarokê/a we nikare here navenda zarok û malbatan û divê ew li malê bimîne. Ji kerema xwe re yekser bi riya telefonê agahiyê bidin navenda zarok û malbatan. Pişt re randevûyekê ji bo PCR-Testê eyar bikin, da ku ev encam were kontrolkirin. Ji bo vê yekê telefonê vê derê bikin 361 10100 an. Gava encama PCR-Testê pozîtîv be, hingê agahî bidin navenda zarok û malbatan. Divê zarokê/a we di îzolasyonê de bimîne. Divê hûn jî testa xwe bidin kirin. Gava encama testê negatîv be, hingê zarokê/a we dikare dîsa here navenda zarok û malbatan.



Piştî encama negatîv a testê ez ê çawa tevbigirim?

Gava encama testê negatîv be, hingê zarokê/a we dikare dîsa here navenda zarok û malbatan. Gava hûn ji ber encama testê dudilî bin û yan jî test betal be, hingê hûn dikarin testê careke din çêkin.

Ji kerema xwe re bizanibin, ku testeke xweser tenê wekî **dîmeneke kurt a bûyerê** ye û divê bi rêkûpêk her car duşeman û pêncşeman were kirin.

Têbinî

Gava hûn nexwazin testa zarokê/a xwe bixwe çêkin, hingê hûn dikarin li navendeke testê zarokê/a xwe bidin testkirin. Wekî alternatîv bi doktorê/a xwe/yê ya zarokan re pêwendî dêynin.

KiTa Bremen
Bremens städtische
Kinder- und Familienzentren

Postadresse
KiTa Bremen
Auf der Muggenburg 5
28217 Bremen

Telefon
0421-361 5700
Telefax
0421-361 59771
E-Mail
office@kita.bremen.de
Internet
www.kita.bremen.de

Copyright: METACOM Symbole © Annette Kitzinger